Bi Zûtirîn Fêrkîrîna Ziman Li Baxçeyê Zarokan û Beriya Dibistanê

Axaftina zimanê almanî, bingeha beşdarbûna dersan û serketinê ye. Zarokên ku temenên wan navbera 3-5 sal in, dikarin bi asanî û bi zûtirîn ziman fêr bibin. Sala destpêkirina baxçeyê zarokan, beriya her tiştî, hînkirina zimanê almanî hedefeke taybetî ye. Li wir, zarokên we ne bi tenê fêrkirina ziman, bi taybetî pir beşên dinê alîkarî dibînîn. Wek di pêşerojê, di dema destpêka dibistanê çî bo wî girînge, û bi şabûna hînbûnê alîkarî dibînin. Di temenê 3 saliya zarokên we de, serîlêdana baxçê zarokan, gîrîngiyek mezin dîgre.

Di wê babetê de, li cem hemû zarokên, ku serî li dibistanan dixin, rewşa zimanê almanî tê kifşkirinê. Zarokên ku zimanê almanî nizanin an jî kêm dizanin, beriya destpêkirina dibistanê, salekê ji bo fêrbûna ziman bi destê mamosteyan alîkarî dibînîn. Beşdariya fêrbûna ziman ya beriya dibistanê, jj bo zarokan pêdîwiyek zarûrî ye.

Alîkariyên Taybetî lî Dibistanan

Alîkariya ku ji bo fêrbûna ziman li baxçeyê zarokan û beriya dibistanê tê kirin, di dema dibistanê jî berdewam dike. Da ku xwendekar bikaribe ji aliyê ziman ve di dersan de bi ser bikeve. Li gor rewşa heremî û li gor rewşa sewiya ziman yên xwendekaran, dibistan bi cûre cûre alîkariyan pêk tîne. Wek:

- Sinifên fêrkirina ziman. Ger zimanê almanî ji bo destpêkirina sinifên normal têr neke;

- Xwendekarên ku sinifên normal dixwînin, lê pêwîstiya wan bi alîkariyên taybetî hene, ji bo wan kursên întensîv û dersên taybetî bi zimanê almanî;

- Alîkariya konsepteke taybetî (wek; hînkirina alfabê bi du zimanan, çalakiyên bi çandiniya cûre cûre, alîkarî ji bo derbasbûna Beşa Duwemîn – I li Beşa Duwemîn II) bi beşdarbûneke pir hejmar yên zarokên penaberan li dibistanan;

Dî wê babetê de, bi zimanê welatên xwe teklîf hen e:

- Li Beşa Yekemîn (dibistan 1 – 4 salan pêk tê) di çarçova aborî, personelî û rêxistinî de, bi zimanê ku li jêr hatine nivîsîn, teklîf hen e: Albanî, erebî, bosnî, farisî, yewnanî, îtalî, japonî, kroatî, kurdî-kurmancî, makedonî, polonî, portekîzî, rusî, sirbî, îspanî û tirkî.

Beşdariya wan dersan, bi dil e û pêwîstiya serîlêdana malbatan heye. Piştî serîlêdanê, beşdarî mecbûr e. Dest jê kişandin bi sebeb nîşandana malbatan, tenê bidawiya dibistanê pêk tê.

- Xwendekarên ku di destpêkê de li Almanya neçûne dibistanê, dikarin bi zimanê welatên xwe werine testkirin.

Beşdariya Xwendekaran:

Piraniya xwendekaran, bi wasitayên gelemperî diçin dibistanên xwe. Berpirsiyarên dibistanan (eyalet û bajar) di bin şertên taybetî de heqên rê didin. Temen, bargiraniya zarokan û emniyeta rêya dibistanê, li ber çav tên girtin. Eger di vê derheqê de pirsên we hebin, berpirsiyarên dayreya têkildar ya dibistanan, dikarin bersîva wan bidin.

Kesên Bervêder (Hember):

Ji bo entegrasyon û daxwazên xwendekarên ku zimanê wan ne elmanî ye, di çar li-qên karmendên dibistanan (Landesschulbehörde) yên eyaletê de kesên bervêder hen e.

Landesschulbehörde
Abteilung Braunschweig
Dezernat 2
Wilhelmstr. 62 – 69
38100 Braunschweig
Tel.: 0531 / 484 – 0

Landesschulbehörde
Abteilung Hannover
Dezernat 2
Am Waterlooplatz 11
30169 Hannover
Tel.: 0511 / 106 - 0

Landesschulbehörde
Abteilung Lüneburg
Dezernat 2
Auf der Hude 2
21339 Lüneburg
Tel.: 04131 / 15 – 0

Landesschulbehörde
Abteilung Osnabrück
Dezernat 2
Mühleneschweg 8
49090 Osnabrück
Tel.: 0541 / 314 - 01

Di her belediyê de, ji bo perwerdekariya pirçandî, karmendên dibistanan yên eyaletê hene:

Abteilung Braunschweig:
Susanne Hopp
HRS Meinersen
Am Gajenberg
38536 Meinersen
E-Mail: Hopp-Meinersen@t-online.de

Abteilung Hannover:
Rainer Langner
Landesschulbehörde
Abteilung Hannover -
Am Waterlooplatz 11
30169 Hannover
Tel.: 0511 / 106 - 7111
E-Mail: rainer.langner@lschb-h.niedersachsen.de

Abteilung Lüneburg:
Axel Erdmann
RS Achim
Waldenburger Str. 8-12
28832 Achim
Tel.: 04131 / 15 - 2885
E-Mail: Axel.Erdmann@lschb-lg.niedersachsen.de

Abteilung Osnabrück:
Harald Kleem
Idafehn-Süd
26841 Ostrhauderfehn
E-Mail: hkleem@t-online.de

Hûn dikarin agahdariyên dinê û navên mixataban, ji malpera înternetê, ji rûpela per-werdeyiyê ya Eyaleta Saxsêna Jêrîn ya bi navê „NiBIS“ bidestxînin. www.nibis.de.

Cihên din yên Agahdarî û Mişawiriyê li Herêma Saxsêna Jêrîn

Arbeitsgemeinschaft MigrantInnen und Flüchtlinge in Niedersachsen e.V.
AMFN
Geschäftsstelle
Zur Bettfedernfabrik 1
30451 Hannover
Telefon: 0511 / 9215803
E-Mail: info@amfn.de

Niedersächsischer Integrationsrat - NIR
Geschäftsstelle
c/o Bildungsverein Soziales Lernen und Kommunikation e. V.
Wedekindstr. 14
30161 Hannover
Telefon: 0511 / 338 798 54
E-Mail: nds-integrationsrat@nds-integrationsrat.de

Verband bi-nationaler Familien und Partnerschaften – IAF
Charlottenstr. 5
30449 Hannover
Telefon: 0511 / 447623
E-Mail: info@iaf-hannover.de

Hûn dikarin agahdariyan li ser beşdarbûna malbatan, ji navnîşana jêrin bigirin:

Landeselternrat
Geschäftsstelle
Königstraße 19
30175 Hannover
Telefon: 0511 / 31 59 83
www.elternrat-niedersachsen.info

Impressum

Herausgeber:
Niedersächsisches Kultusministerium
Presse- und Öffentlichkeitsarbeit
Schiffgraben 12
30159 Hannover

E-Mail:
Pressestelle@mk.niedersachsen.de

Bestellungen:
Fax: 0511/120 7450
E-Mail: Bibliothek@mk.niedersachsen.de

Druck:
Hahn-Druckerei, Hannover

März 2006

Niedersächsisches
Kultusministerium

INFO KURDISCH

Li Saxsena Jêrîn Dibistan

Belavoka Agahdariyê ji bo Malbatan

Niedersachsen





Malbatên hêja,

Zaroka we li Saxsena Jêrîn êdî dest bi dibistanê kiriye. Dûweroja hemû zarokan bi şabûna hînbûnê, bi serketina hînbunê û bi dawîanîna perwerdeyê, bi piranî gîrêdayî nîn e.

Dê û bav, zarokên xwe baştir nas dikin. Di malê de, piştgirî û teşwîqkirina wan bi zarokên wan re wê bibe serketinê zarokên we li dibistanan. Axaftina we bi wan re, li ser kar, xebat, jiyan û xwendina wan yên rojane, dibe sedemê serketinên wan. Her waha pêvendiyên baş li gel dibistanan û eleqeyên we bi qewimandinên dibistanê re jî dibe sebebeke girîng. Bi wî awayî hûn alîkariya mamosteyan dikin, yên ku hewl didin bi we re tevayî ji bo zarokên we perwerdeyeke baş pêk bînîn.

Ev belavoka, ku bi zimanê we hatiye amadekirin, li ser sîstema dibistanên Saxsena Jêrîn wê agahdariyek bingehîn bide we: Li ser cûre cûre reformên dibistanan, bi dawîanîna dibistanan û şertên hiqûqî ya muhîm; li ser giringiya bi serîlêdana baxçeyê zarokan; û bi zanîna axaftina zimanê Almanî, ji bo perwerdekirina zarokên we, herwiha imkanên tesîra wî li ser malbatan.

Di gel wan, di wê belavokê de hûnê çend navên kesên bervêdar (hember), yên li dibistanê an jî derveyî dibistanê, bibînin. Ger li ser serîlêdana zarokên we li dibistanan, pirsên we hebin, hûn dikarin pêwendî li gel wan kesên bawermend deynin. Ew dikarin bersîvên we bidin.

Em hêvî dikin, ku ev belavoka agahdariyê wê ji we re bibe alîkar, da ku hûn rêyeke baş hilbijêrin. Her waha emê pir kêfxweş bibin, eger ew bibe alîkar, da ku hûn pêvendiyên xwe bi dibistanên zarokên xwe re baş bikin; her wisa pêwendiyên baş li gel mamosteyan xurttir bikin. Herdû jî pêdiwiyek e, da ku zarokên we ji bo hînbûne motîve bibin û di perwerdekirinê dê bi serkevin.

Bernd Busemann
Wezîrê Çandê yê Saxsena Jêrîn

Gabriele Erpenbeck
Berpirsiyarê Biyaniyan li Saxsena Jêrîn

Zagonên Dibistanan yên Saxsena Jêrîn

Di Zagonên Dibistanan yên Saxsena Jêrîn (NSchG) de, pêdiwiya dibistanê, perwerdebûyîn û beşdarbûna malbatê, bi awayekî rêk û pêk cih girtiye.

Pêdiwiya Dibistanê

Mafên hemû xwendekarên ku li Saxsena Jêrîn îqame dikin hene, ku ew perwerde bibin û her waha berpirsiyariya wan heye, ku ew bi awayekî rêk û pêk beşdarî dersan bibin.

Zarokên ku hetanî 30ê hezîranê 6 saliya xwe qedandibin, sala paş divê ew biçine dibistanê. Pêdiwiya dibistanê 12 salan dajo.

Wazîfa Perwerdekirinê

Wazîfa dibistanan ew e, ku şexsiyeta xwendekaran pêşde bibe. Divê ew hînbibin; li gor bingeha exlaqî danûstandinan bikin; her waha nirxên olî û çandî nas bikin û bigrin ber çavan. Divê xwendekarên Saxsena Jêrîn bi qabîliyet bin, da ku bikaribin bi însanên din re pêwendiyên bi heq, alîkar û bi tolerans bikar bînin.

Beşdariya Malbatan

İmkanên malbatan an jî berpirsiyarên zarokan hene, ku ew di dibistanê de alîkarên zarokên xwe bibin. Berpirsiyarên zarokan yên sinifekê, dikarin Yekitiya Malbatan ya Sinifan pêk bînin. Di nav xwe de jî, serok/a û cîhgir/a wê hilbijêrin.

Bi beşdarbûna Serokên Yekitiya Malbatan ya Sinifan, Konseya Malbatan ya Dibistanan pêk tê. Her wisa ew di nav xwe de serokekê/î û cîgirekê/î hildibijêrin. Serokê/a Konseya Malbatan ya Dibistanan, di karên danûstandinê de, hember Rêvabirê Dibistanê berpirsiyar e.

Pêwîst e, ku Rêvabirê Dibistanê û Mamosteyên Dibistanê, di derheqa rêvebirina dibistanê, pîvana çalakiyan, naverok, pîlankirin û cih bi cih kirina dersan, Konseya Malbatan ya Sinifan û Yekitiya Malbatan ya Sinifan agahdar bikin. Tenê agahdarî bes nîn e. Divê îmkan hebin, ku axaftin, pirs û pêşniyar bên kirin. Li gor Zagonên Dibistanan ya Saxsena Jêrîn (NSchG), Yekitiya Malbatan ya Sinifan û Konseya Malbatan ya Dibistanan, dikarin di derheqa dibistanan da hemû pirsên xwe bînin ziman.

“Dibistaneke jîndar, ne tenê ji xwendekaran û mamosteyan pêk tê, berevajiyê wê, pêdiwiya dibistanê bi beşdarbûna malbatan jî heye.”
Bernd Busemann, Wezîrê Çandê yê Saxsena Jêrîn.

Wextekî wisa ye, ku di hemû dibistanan da zarokên penaberan hene. Ji ber vê yekê jî, beşdarbûna malbatên penaber nirxekî mezin digire. Di § 90 (2) ya Zagonên Dibistanan yên Saxsena Jêrîn (NSchG) de, ev yek bi vî awahî ye:

“Dibistaneke ku tê de bi kêmayî 10 xwendekarên biyanî lê dixwînin û ji berpirsiyarên wan zarokên ku kesek di Konseya Malbatan ya Dibistanê de cih negrin, ew berpirsiyaran dikarin ji nav xwe endamek taybetî û endamek cîgir ji bo Konseya Malbatan ya Dibistanê hilbijêrin.”

Divê temsîlkirina malbatên penaber di nav Konseya Malbatan ya Dibistanê de pêk bê, da ku di niqaşan da berjewendiya taybetî ya koçberiyê an jî entegrasyonê li
ber çavan bên girtin.


Nûnerên malbatan ne tenê li dibistanan, li belediyan û eyaletê jî hene. Li wir, yek bi yek li ser dibistanan û pirsên wan tên ziman. Wek Konseya Malbata ya Dibistanê, di Konseya Malbatan ya Eyaletê de jî, karkirina malbatên biyanî bi awayekî eşkere hatiye cih bî cih kirin. Di Konseya Malbatan ya Eyaletê de berpirsiyarên xwendekaran, di hemû şiklên dibistanan de, wek berpirsiyarên xwendekarên biyanî, bi her awayî bên temsîlkirin.

Ji bo zarok û ciwanan, di dibistanan de hînbûneke bingehîn û rêkûpêk girîng e. Zagonên Dibistanan yên Saxsena Jêrîn, îmkan dide berpirsiyarên xwendekaran, ku beşdarî cihê perwerdebûnê bibin. Ew derfet ji bo malbatên penaberan jî hene. Hûn jî di nav Konseya Malbatan ya Dibistanê da kar bikin.

Kırêkırına pırtûkên hînbûnê bı bedel

Dı dıbıstanên Saxsênä Jêrîn da îmkan henın, ku bı bedel pırtûkên dıbıstanan kırêbıkın. Bı wî awayî hûn dıkarin, jı qîymetên pirtûkên dibistanan, sısêyan düdo kêmtır xerc bıkin, bi gotinek dın jı sisêyan du par qezenç bıkin. Malbatên ku sısê an jî bêtır zarokên wan henên, jı bo hemû zarokan yek bı yek bedel kêmtir bê hesıbandin. Dı hîn şertan da malbat dıkarin jı bedela kırêkırınê azad bıbın. Dı wê derheqê da hûn dıkarin jı hemû dıbıstanan agahdarîyan bıgrın. Hûn dıkarin bı wî awayî şert û mercan jı înternetê, lı ser navnîşana www.mk.niedersachsen.de peyda bıkin.

Sîstema Dibistanê ya Sachsena Jêrîn



Şiklên (Formên) dibistanan

Dibistana Bîngehîn (Grundschule) ji 1 - 4 salan pêk tê û di hin dibistanan de baxçeyê zarokan jî heye. Baxçeyên zarokan yên dibistanan, bi taybetî beşdariya wan zarokên ku 6 salî ne û hê ji bo sinifa 1ê ne amade ne, dax-waz dikin. Di dawiya sinifa 4an de, dibistana bingehîn ji bo şiklên dibist-ana pêşerojê pêşniyar dikin. Berpirsiy-arên zarokan yên perwerdekariyê, wextekî dûr û dirêj bi mamosteyan re danûstandinan dikin û da ku bikaribin di derheqa şiklên dibistanê da biryaran bidin.

Dibistana Navîn (Hauptschule) ji 5 – 9 salan pêk tê û her waha îmkana serî-lêdana sinifa 10an jî heye. Di dawiya sinifa 9an de dikarin dîploma dibistana navîn bigirin. Di dawiya sinifa 10an de jî dikarin tiştên li jêr hatine nivîsandin, bidestxînin.
- Pêşdebirina Beşa Duwemîn – I: Kesên ku vê dîplomayê verdigrin, mafên wan henin, ku dest bî lîseyek gelemperî an jî lîseyeke meslegî bikin.
- Beşa Duwemîn – I: Dîploma dibist-ana navîn ya bilind an jî dîploma dibistana navîn.

Kesek bixwaze dîploma verbigre, pêwîst e sinifa 9'an an jî 10'an biqedî-ne.

Dibistana Navîn ya Bilind (Realschule) ji 5 - 10 salan pêk tê. Ders jî wazîfe û wazîfên hilbijartî, her weha bi serbestî bi hevra karkirinê pêk tên. Di dawiya sinifa 10'an da jî dikarin tiştên li jêr hatine nivîsandin, bi dest bixin.
- Pêşdebirina Beşa Duwemîn – I: Kesên ku vê dîplomeyê verdigrin, mafên wan hene, ku dest bî lîseyeke gelemperî an jî lîseyeke meslekî bikin.
- Beşa Duwemîn – I: Dîplomeya dibist-ana navîn ya bilind an jî dîplomeya di-bistana navîn.

Kesek bixwaze dîplomeyê verbigre, pêwîst e sinifa 10an biqedîne.

Lîse (Gymnasium) ji 5 – 12 salan pêk tê. Di dawiya sinifa 10an de, dikarin tiştên ku li jêr hatine ni-vîsandin, bidestxînin:
- Pêşdebirina Beşa Duwemîn – I;
- Beşa Duwemîn – I: Dîplomeya dibist-ana navîn ya bilind an jî dîplomeya dibis-tana navîn.

Di dawiya sinifa 12'an de, dikarin ji bo hemû dibistanen bilind (Abîtur) bidest-xînin. Ew, ji bo hemû dibistanen bilind derbas dibe.

Dibistana Taybetî ya Alîkar: Zarokên ku pêşketin, hînbûn, perwerdebûna wan ne ewqas baş in, ku bê mamo-steyên taybetî nikarin dersên xwe bi rê ve bibin, serî li wê dibistanê didin. Hewalekirina zarokan ji bo wan dibist-anan, pêwîstiya îmtîhanê heye. Hînbû-na zimanê almanî an jî kêmasiya zim-anê almanî, nabe sebeb ku zarokan he-waleyî wê dibistanê bikin.

Dibistana Muşterek ya Tevayî (KGS) an jî Dibistana Muşterek ya Hema-heng (IGS): Şûna dibistana navîn, dibistana navîn ya bilind an jî lîsê bix-wîne. Dibistana Muşterek, ji 5 – 12, an jî 13 salan pêk tê. Weke dîplomeya dibistana navîn, dibistana navîn ya bilind an jî lîsê daxwaz bikin. Pêdiwiya dîplomeyê bi beşdarbûn û serketina îmtahanê bi dest dikeve.